


HOSTAYÊ PÊNÛSÊ YÊ NAVDAR

(Ji bo bîranîna mamosta Wezîr ê Eşo)



Ji bo ku nivîsk'arek bê naskirin û hezkirin, du mercên sereke pêwîst in: **ya yekem** – eger ew xwedî pênûsek a berhemdar e, ew ji bo gel dinivîse û bi gel r'a bi zimanê wî diaxive; **û ya duyem** – eger civakek a xwendî û wêjehez a xwendevanan berhemên nivîsk'ar dixwîne, dinirxîne û ji bo xwe watedar dike...

Ev pêvajoyek a xwezayî ye, û p'êwendîyên hemû nivîsk'ar û xwendevan jî, hema li ser hebûna van mercan û li gor van avadibin.

...

Her çiqas, îro K'urdistan çarp'arç'ekirî ye û mîtîngehek a navnet'ewî ye, zimanê k'urdî bi qedexê û astengîyan r'a r'ûber'û ye, û k'urd jî hê bi du alfabêyan dinivîsin û dixwînin, lê, yek e, hem li K'urdistanê, hem jî li derveyî sînorên wê bi zimanê k'urdî berhemên wêjeyî bê r'awestan tên weşandin û xwendin.

Û di vî k'arê pîroz da r'ol û k'eda nivîsk'arên k'urd p'ir' girîng e!

...

Dema di welatê me da zimanê me qedexê bû, dema nivîsk'ar û r'ojnamegerên k'urd dihatin girtin, an bê şop dihatin serwindakirin, dema p'irtûk, kovar û r'ojnameyên k'urdî dihatin şewitandin, di bernameyên dibistanên gundên k'urdan ên Ermenîstana Sovêtî da (û di vê k'omarê da jî, wê demê 24 gundên k'urdan hebûn!) p'erwerdeya ziman û wêjeya k'urdî li ser asta dewletê hatibû p'ejirandin, bi zimanê k'urdî p'irtûk û r'ojnâme dihatin weşandin, R'adîoya Yêrêvanê bi zimanê k'urdî weşan pêk tanîn. Di nava Yekîtiya nivîsk'arên Ermenîstanê da şaxê nivîsk'arên k'urd hebû.

Wê demê Ermenîstana Sovêtê bibû navenda gulvedana wêje, çand û hunera k'urdî.

Ev jî serdemek bû!...

...

Mamosta Wezîr ê Eşo yek ji wan nivîsk'arên k'urd ên Yekîtiya Sovêtê yê nivşa navîn bû, ku berhemên wî bi hezkirin dihatin xwendin.

Wê demê xwendk'arên k'urd ên ku ji welêt hatibûn û di zanîngehên Yekîtiya Sovêtiya da xwendina xwe didomandin, bi berhemên pênuşa mamosta r'a nas dibin, wan dixwînin û bi xwe r'a dibin Welêt. Û bi wî awahî, berhemên wî digihîjin ber destê xwendevanên k'urd ên li K'urdistanê û derveyî sînorên wê ...

Û, eger berê navê Wezîr ê Eşo wan kesan dizanibûn, ên ku p'ir'î-hindikî bi çand û wêjeya k'urdên Yekîtiya Sovêtiya r'a nas bûn, ew îro hem li K'urdistanê, hem jî li derveyî wê li ser zarê her wêzehez û wêjezanekî k'urd e.

Û r'êza van kesan jî, r'oj bi r'oj, her çiqas diçe, zêdetir û girseyîtir dibe ...

Gotineke pêşiyên me heye, dibêjin: *"Bilindayîya ç'îyan ji dûr va çêtir tê xuyan!"*

Bi r'astî jî wisan e!

Çiqas sal û dehsal dibihurin, û em ji dûrva li r'êya jîyan û afrandariya mamosta Wezîr ê Eşo dinihêr'in, ewqasî mezinayîya wî baştir tê xuyan. Û ew îro êdî, wek hostayê pênuşê yê behremend (*talented*), bûye nîrxekî net'ewî yê wat'eyî...

Berhemên pênuşa mamosta êdî jizûva li K'urdistanê û derveyî wê hatine û îro jî tîn weşandin, êdî di derbarê berhemên wî da lêger'in û nîrxandinên balk'êş ên wêjezan û wêjehezan di weşanên cuda da derketine r'onahîyê û li holê ne.

Lewra jî, her çiqas, mamosta Wezîr ê Eşo êdî yanzdeh sal berê xatirê xwe ji vê Cîhanê xwestye (23.01.2015.) û mala xwe ji nav me barkirye, lê ew bi berhemên xwe yê wêjeyî û lêger'inî va beşdarî jîyana gelê xwe ya çanda r'uhî-r'ewanî dibe. Û ji vir û pêva jî nivşên nû de berhemên wî bixwînin, ewê li ser bingeha wan p'erwerdeyê bibînin, bi r'êya wan bi jîyan, çand û wêjeya k'urdên Yekîtiya Sovêtiya r'a têk'îlîdar bibin, nas bikin û di wî warî da, wek p'arç'eyekî Cîhana k'urdî, lêger'inan pêk bînin û di nava wê çarç'oveyê da t'erefên cuda yê wêjeya mamosta Wezîr ê Eşo ji bo xwe û nivşên pêşer'ojê vekin.

Û Mamosta jî, wek Kesayetîyeke r'onî, wek afrandarekî behremend, wek hostayekî pênuşê yê mezin, wek merivekî civakhez û gelêrî, dê di nava bîra gelê xwe da her û her zêndî bimîne.

Helbet, di derbarê jîyan û afrandariya Mamosta Wezîr ê Eşo da dê kesên cuda jî gotin û bîranînên xwe bînin zimên, an binivîsin, hinek dê navên berhemên wî, û lêger'inên di derbarê wan da jî wat'edar bikin. Jixwe, di jînenîgarîya mamosta da jî di wê derbarê da t'êra xwe agahî hene, lewra jî, ezê li vira, wek şagirtekî wî yê dibistanê, wek birayê wî yê pênuşê û hogirê wî, bi r'êzdarî serê xwe li ber bîranîna r'onî ya wî Mirovê Mezin biç'emînim û çend bîranînên xwe di derbarê wî da p'arvebikim.

Lê berî vê, ji bo ku kesayetîya mamosta Wezîr ê Eşo, wek a afrandarekî, baş bê têgihîştin û wat'edarkirin, minê bixwesta balê bik'işînim ser hinek r'astîyan: divê tişteke bê zanîn, ji bo pêkhatina kesayetîya nivîsk'ar û lêger'inerekî vê astê, ji bilî t'aybetmendiyên kesî yê xwezayî, du bingeheke girîng hebûne: *malbeta Eşoyê Hûtî û civaka gundê P'ampa K'urdan*, li k'u ew gihîştye û mezinbûye, û xwendina wî ya zanîngehî – di warê dîrokzanîyê da...

Malbeta Eşoyê Hûtî – a bavê Wezîrê Eşo, dawîya Şer'ê Cîhanê yê Yekem ji ber zulm û zordariya R'oma R'eş, ji ber t'evkujî û wêranîyan bi neç'arî welatê xwe dit'erikîne û ji Serhedê (Bakûr ê K'urdistanê) derbazî Împêratoriya R'ûsîyayê (Ermenîstana îro) dibe, li vira di gundê P'ampa K'urdan da diêwire û bingeha mala xwe datîne ...

Piştî demekê malbeta wan ji ber pîrsgirêkên aborî ji bo demekê diçe T'bîlîsa p'aytexta Gurcistanê, lê t'u carê nigê xwe ji P'ampê nabir'e.

Û Wezîr jî li T'bîlîsê tê cîhanê.

Pişt'r'a, dema Wezîr zar'ok bûye, malbeta wan vediger'e gundê xwe – P'ampa K'urdan. Ew li vira diçe dibistanê. Piştî dawîkirina dibistana hevtasale, Wezîr xwendian xwe di dibistana navîn a bajarê T'bîlîsîyê da didomîne.

T'ibîlîsî û dibistan di cîhê xwe da, lê P'amp û p'ampî hiç kêlîyekê ji bîra wî naçin, ew her carê, demên betlaneyên dibistanê dir'eve-tê gundê xwe û bi hesret û hezkirin di nava gundiyan xwe da xwe ji bîr dike. Û p'ampî jî bi heman hezkirin û hesretê bersîva wî didin, û hemû jî, bi t'aybet jî mezinên gund, bi şîrinayî jêr'a dibêjin – *Wezîrê me!* Û bi van herdu

p'eyvan ewana hemû hestên xwe tînin zimên – *hesret, hezkirin, qîmetdayîn!*

Û ev P'ampa K'urdan, a ku berî hatian wan, êdî derdorê 120 salan hebûye, bi hatina malbetên p'enaberan r'a r'eng û awazne nû werdigire.

K'urdên êzdî, yên ku berî wan hatibûne û ew gund avakiribûne, gelek nîrx û kevneşopîyên net'ewî p'arastibûne, ewana heya navên cîh û warên welatê xwe, yê ku wana bi neç'arî t'erikandibûne, bi xwe r'a bi bîrî anîbûne û yek bi yek li ser wargehên gundê xwe yê nû (ên P'ampa K'urdan) danîbûne. Bi vî awahî, ewana bi xiyalî li dora xwe K'urdistanek a biç'ûk avakiribûne.

Û piştî hatina van malbetên p'enaber, ên ku ji ber zordarîyê, şer' û p'evçûn û t'evkujîyan gelek êş û azar ditibûne, hem ji hêlekê va bi kevneşopîyên binecîhan r'a, r'abûn-r'ûniştin û r'a û r'izma wan r'a nas dibin û gelek tiştan ji wan werdigirin, hem jî r'engê xwe didin wê civakê. Û ev Cîhana P'ampa K'urdan, wek giraveke k'urdî li derveyî Welêt, gav bi gav digihîje, bi hemû r'eng û awazên xwe va, bi kevneşopî û r'abûn-r'ûniştina xwe va, bi r'ûspî û zane û bîrewarên xwe va, bi dayîkên xwe yên dîlovan – Xatûnên kurmançîyê va, bi xortên xwe û zerî-domanên xwe va (ên P'ampê!), bi dengbêj û sazbandên xwe va, bi xwendevan, xwendk'ar û r'ewşenbîrên xwe va!

Belê, t'am cîhaneke k'urdî – li derveyî Welêt!

Û li asîmanê vê Cîhana K'urdî, li r'ex ên dinê stêrka Wezîrê Eşo jî geşvedide û bi wan r'a ji wir pirîskên xwe digihîne asîmanê welatê kal û bavan – K'urdistanê...

Êdî di salên zar'okatîyê da Wezîr p'ir' zîrek û çalak bûye, hem jî civakhez û sowbethez bûye. Ew bi hezkirina berbi dîrok û wêjeyê, zargotin û stranên gelêrî va ji zar'ok û ciwanên dinê cuda bibûye.

Piştî dibistana navîn dê Zanîngeha dewletê ya bajarê Yêrêvanê bê, ewê li ser zanistên dîrokê k'ûr bibe. Piştî'r'a ewê bê gundê xweyî hezkirî – P'ampa K'urdan, bibe berpirsyarê dibistanê û mamostayê dîrokê. Û ewê dersên dîrokê bide me – dersên Dîroka Cîhana Kevnar. Ewê destê me – zar'okên dersxaneyên 5 – 6-an bigire û bi r'ê, ç'îya û gelî-gebozên dîrokê r'a bibe Cîhana K'evnar. Û ewê di derbarê bûyerên wê da ji bo me wisa vebêje, qey bibêjî ew bi xwe hema hêja ji wir hatibûye, ku ewî ew hemû li ber ç'avê xwe dîtibûne – *ewqas r'astîn, ewqas r'esen û ewqas zêndî!* ...

Belê, paşê ez bi zimanzanîyê mijûl bûm, û hîç demekê nedihat ber heşê min jî, ku ezê ji bilî zimanzanîyê û wêjeyê berê xwe bidim mijareke dinê jî, bi t'aybet jî – dîrokê. Lê, dema lêpovajîkirina agahî û daneyên dîrokî di vê cîhana me da bibûn tiştêkî r'ojane û li şûna r'astîyan dihatin r'aberkirin, di nava min da hest û hîsên cuda serî hildidan: *ma, çawa dibe, ma, mirov jî li hember berovajîkirina r'astîyên dîrokî ewqasî bédeng bimîne, ma, mirovê nikaribe, gelo, r'astîyan bibîne û derxe r'onahîyê?* – Lê wê demê, di warê zanistê da ji bilî zimanzanîyê ez bi tiştêkî dinê va ewqasî gîro nînbûm...

Dema ez di bîra xwe da r'ê û r'êbazên têgihîştin, r'avekirin û r'onîkirina r'astîyên dîrokî diger'yam, dersên Dîroka Cîhana Kevnar ên mamosta Wezîr hatin bîra min, helwest û şewazê vegotina wî ya agahî û daneyan hatin ber ç'avê min...

Û carekê min bi Skaypê ji mamostayê hêja r'a p'êwendî danî...

Di sêrî da em li ser pirsên r'ojane axivîn, paşê em bi hev r'a bi bîrî vege'yan gundê xwe – P'ampa K'urdan... P'ir' hestiyar bû, ç'avên wî t'uje hêsir bûn. Min hema li vir fersend ji destê xwe berneda, û mamostatîya wî, dersên dîrokê anîn bîrê... Paşê ez bi fesal hatim ser pirsê lêpovajîkirina dîrokê û jê pirsî, k'a, gelo wisa dibe, ku em nikaribin di vî warî da tiştêkî bikin, an bibêjin? ...

Ewî li vir yekser navber da axavtina min û pirsî, k'a, gelo, naha konkrêt çi pirs bala min dik'işînin? Min pirsên xwe li dû hev r'êzkirin, û got, k'a, mirov dikare li k'u agahî û dîtînen cuda biger'e?

Kêlîyekê k'et nava mitaleyan, paşê got:

– Tu gelek tiştan dikarî di p'irtûkxaneyê navendî ya R'ûsîyayê da bibînî, ji xwe têt'îliyên te bi wê r'a hene. Wekî dinê, meriv îro dikare di întêrnêta da gelek tiştan bibîne... Wekî dinê..., wekî dinê... – ewî weha li dû hev dubare kir, k'et nava mitaleyan û paşê

domand: – Piştî hevtêyekê t'êlêfon bike, ezê ji bo te hinek tişt amade bikim. – Kêlîyekê r'awestya, paşê lê zêde kir: – Na, na ! Ezê bi xwe t'êlêfon bikim...

Û piştî sê r'ojan t'êlêfon kir:

– ... Dizanî, – ewî got, – mijar balk'êş e, lê giran e, ma ne, tu bi zimanzanîyê va mijûl dibî, tuyê bikaribî, gelo, vî barî r'akî?

– Ma, meriv nikare bicêr'ibîne? – Min bi xawêşî jê pirsî û domand: – Ez giranîya mijarê têdigihîjim. Min careke dinê hinek agahî û daneyên dîrokî yên ç'avkanîyên cuda li ber ç'avan r'a derbazkirine. Min êdî heya hinek xal û r'ê û r'êbazên lêger'înê jî ji bo xwe dyar kirine. Helbet, eger mirov bi wan r'êbazên lêger'înê mijarê hilde dest, ên ku di cîhana dîroknûsîyê û dîrokzanîyê da bûne kevneşopî û xwe dubare dikin, dê dijwar bikaribe xwe bigihîne r'astîyan. Lê, eger mirov li pirsê, bi giştî, û daneyên dîrokî yên heyî bi ç'avê r'exneyî binihêr'e, her weha agahî û daneyên dîrokî ji hêla zimanzanîyê va jî binirxîne: *ji hêla têrmînolojîyê û êtîmolojîyê va?! – Ma ne, di serdemên dîrokê yên cuda da ewqas agahî, dane, têgîn û têrmîn bi hev hatine guhar'tin û lêpovajîkirin! ...*

– Wê demê, – mamosta navber da axavtina min – wek ku tê xuyan, te her tişt plankirye, û ezê jî – çî ji destê min bê! Va, min ji bo te navnîşek a p'irtûkan amade kirye, her çiqas tu bi xwe jî dikarî wan bibînî, û wisa jî hinek r'ûp'elên çend p'irtûkên k'urdî, yên ku tuyê nikaribî li wir bibînî, min ji bo te kopî kirine. Ezê wan ji te r'a r'ê bikim, piştr'a, eger pirsên te derên, em dikarî bi axivîn.

Min li vir spasdarîya xwe ji mamostayê hêja r'a got, û me xatirê xwe ji hev xwest...

Helbet, min berê jî di derbarê pirsên dîrokî da nivîsibûn, lêbelê, ew bêhtir lêger'în-nirxandinên r'ojsamegerî bûn, ne ku ên zanistî (her çendî, ew li ser bingeha lêger'înên zanistî hatibûn nivîsîn!), lê evan p'êwemdîyana dîsa bîranînên dema şagirtîya min a dibistanê hişyarkirin – vê carê bi şêwazekî bêhtir wat'edar. Û ewana di nava min da baldarîya berbi pirsên dîrokê xurttir û hêztir kirin.

... Û paşê, hê dereng, r'êzegotarên min di derbarê van babet'an da hatin weşandin, ên ku dê paşê bibin p'irtûkên di derbarê olên gelê k'urd ên kevnar *êzdîtîyê û zerdeştîyê* da – di bin sernivîsa giştî ya “*Berbi sur'ên cîhana kevnar va!*”. Helbet, ev ne lêger'înên olzanîyê ne. Na! Di wan da bingehe, r'ewş û mercên dîrokî yên pêkhatina wan olan, p'evguhar'tin û lêpovajîkirina têgîn, têrmîn û daneyên dîrokî tînin nirxandin û bi êtîmolojî tînin dahûrandin û vebijartin, ên ku ji hêla lêpok'arên (*sahtekâr*) r'astîyên dîrokê va hatibûne lêpovajîkirin!

Pey van r'a, helbet, gotar, nirxandin, govtûgoyên dinê jî hatine!...

Piştî demekê ez û mamosta careke dinê bi r'êya Skaypê bi hev r'a axivîn. Di navberê da ewî got:

– ... Min digot, qey te heya dawîyê xwe daye zimanzanîyê, û hiç nedihat ber heşê min jî, ku tuyê xwe di warê dîrokê da bicêr'ibînî, ew jî – di warê dîroka kevnar da!

– Dizanî, – ez kêlîyekê k'etim nava mitaleyan û paşê min domand, – dema pirsên *têk'lîdarî dîrokê di serê min da diger'yan, t'avetî nedidan min, demên şagirtîya min dihatin bîra min, dema te dersên Dîroka Cîhana Kevnar didan me... Berê jî, dem bi dem bîranînên wan deman hişyar dibûn, wek bîrî. Lewra jî, min wan deman her bi bi hestiyarî – bi ç'avê hesreta zar'otîyê li wan dinihêr'î... Lê van demên dawîyê bi t'aybet dîmenekî dema zar'otîyê di bîra min da hişyar dibû – p'ir' r'astîn, p'ir' zêndî!*

Dibe ku te jibîr jî kiribe? – Min gotina xwe bi pirs domand: – *Tê bîra te, min carekê di wê derbarê da ji te r'a nivîsibû: “ ... dersên dibistanê destpê bûn, û te destê me girt û em bi r'êya zanînên dîrokê r'a birin-gîhandin R'oma kevnar, Misrê, Asoristanê, Navç'emkê (Mêzopotamya), Kart'agênê ... Te sur'ên t'evgerên leşkerî yên Hannîbal û Alêk'sandr ê Makêdonî li ber me vekirin... Her çiqas di bernameyên p'erwerdeya dibistanê da pirsên dîroka k'urd û K'urdistanê nînbûn jî, te hey li nav r'a agahîyên di derbarê Medya kevnar, serhildanên gelê k'urd da ji me r'a mînak tanîn ... ”*

Û evan bîranînan wêrekî didan min!

Spas ji bo dersên te, Wezîr can! – Û wê demê ew ji van gotinên min p'ir' hestiyar bû, teyê bigota, qey li p'eyvan digere, ji bo tiştêkî bibêje, paşê bi dengêkî nimz pirsî:

– *Û ew hemû ji bîra te neçûne?*

– *Çawa dikaribû?! – Min got. – Hê jî, ez dem bi dem di xewnên xwe da vediger'im, gundê me – wê girava k'urdî, û bi hesret r'ojên zar'otîya xwe bîr tînim...*

Û, bi r'astî jî, ewqas dehsal bihurîne, êdî mamosta Wezîr bi fizîkî ne di nava me da ye, lê îro jî ew di bîra me hemûyan da zêndî ye û bi berhemên xwe, bi bîranîna xwe ya zêndî û r'onî va beşdarî jîyana me dibe.

Ya girîng û hêja jî, hema ev e!

...

Û ya dawîyê.

Her merivek dem bi dem r'ojên jîyana xwe yên bihurî li ber ç'avan r'a derbaz dike, r'êya jîyana xwe jinûva dinirxîne û wat'edar bike...

Û ev tiştekî xwezayî ye!

Her r'ojbûneke mirov dibe xaleke nû, destpêkek a nû di jîyana wî da ...

Ya mamosta Wezîr ê Eşo jî wisa bûye, ewî jî di her r'ojbûneke xwe da bi ç'avekî nû li r'êya jîyana xwe ya bihurî nihêr'ye, k'ar û berhemên xwe nirxandine û ew bi awayekî nû wat'edar kirine, lê îro û jî vir û pêva xwendevan, wêjehez û wêjezan û pisporên ziman û çanda k'urdî dê encamên lêgerînên xwe yên di warê berhemên pênûsa mamosta da binirxînin, bi awayekî nû wat'edar bikin û p'arvebikin,. Û her carê ewê tiştekî nû, p'arç'eyekî cîhana wêjeya nivîsk'arê nemir ji bo xwe û nivşên pêşer'ojê r'ave û wat'edar bikin...

Wisan e, jîyan r'anaweste, û mamosta Wezîr ê Eşo jî, her çiqas bi fizîkî ne di nava me da ye, lê bi r'êya berhemên xwe, bi mitale û r'amanên xwe beşdarî pêvajoyên jîyana me dibe. Ew bi berhemên xwe beşdarî pêvajoya p'erwerdekirin û gîhandina nivşên nû dibe û r'êya wan r'onî dike, ji bo ku ew jîyanê bi r'eng û awazên wê yên cuda va têbigihîjin û wat'edar bikin...

Bi r'êzdarî û hezkirin,

Korda Mad (Ezîz ê Cewo)

Mijdara sala 2025-an.

Bajarê Pyatîgorskê/Fêdêrat'sîona R'ûsîyayê.